RESET
Training and Support

Abdullah's message about volunteering

"Hello, I am Abdullah Al-Khalaf from Syria. I left my university in Syria in 2012 and went to Jordan. I tried to complete my university degree in Jordan. I was a fourth-year student in the Arabic Language Department at the University of Aleppo, but I could not because of the difference in the educational system between Syria and Jordan. I registered myself and my family at the United Nations High Commissioner for Refugees and was happy when I was selected for the UK Vulnerable Persons Resettlement Scheme. After I arrived in the UK, I was welcomed by a group called: Braid Blackfriars.

They helped me a lot in integrating into the community through English language lessons. I also started asking for a place to volunteer so I could hear more English and therefore learn it quicker. One of the group coordinators helped me and took me to an organization called Refugees Welcome. From there, I joined the Oxford Forum, which is a program to integrate refugees into society and help them get a job. I started writing a paper on Syrian clothing and underwent a tour guide training course at the museum at the Pitt Rivers Museum. We got the award for the best volunteering team in the United Kingdom. Volunteering gave me great confidence in learning faster as I interacted with people who spoke English and through volunteering I was able to make friends in Oxford. I also got a job at the Pitt Rivers Museum as a visitor assistant and a tour guide in the same museum.

The importance of volunteering in the United Kingdom lies in obtaining practical experience in any field you like, unlike the existing system in Syria, where you need many certificates to get a job. I am happy now that I have a job and a source of income that encouraged me a lot to continue and develop even further. Now, I am getting ready to get into a university in the United Kingdom and study history. I advise everyone to volunteer and not to be hesitant or afraid of the language barrier. On the contrary, you will learn more language in less time when you volunteer. I do not forget the advice of one of my school teachers who once said that 'we teach you 20% of the language at school and the rest you must acquire'. Go and volunteer even if it is for one day and you will see the difference soon and you will find success. Good luck!"

Peyama Abdullah derbarê karên dilxwaziyê de

“Silav, ez Abdullah Al-Khalaf ji Sûriyeyê me. Min sala 2012an li Sûriyeyê dev ji zanîngeha xwe berda û çûm Urdunê. Min hewl da ku xwendina xwe li Urdunê bibim serî. Ez li Zanîngeha Helebê xwendekarê sala çaran yê Beşa Zimanê Erebî bûm, lê min nikarî ji ber cudahiyên pergalên perwerdehiya Sûriyeyê û Urdunê dewam bikim. Min xwe û malbata xwe li ba Komîseriya Bilind ya Penaberan ya Neteweyên Yekbûyî qeyd kir û ez kêfxweş bûm ku ez ji bo Bernameya Cîwarkirina Kesên Bêewlehî ya UKê hatim hilbijartin. Piştî ku ez gihîştim UKê ez ji aliyê komkê ve hatim qebûlkirin ku dibêjinê: Braid Blackfriars.

Wan di mijara entegrebûna nav civakê bi riya dersên înglîzî gelekî alîkariya min kir. Min her wisa ji wan pirsa karekî bi dilxwazî kir ku zêdetir înglîzî bibihîzim ku zûtir fêr bibim. Yek ji koordînatorên komê alîkariya min kir û ez xistin nav rêxistineke bi navê Refugees Welcome. Ji wirê ez ketim nav Oxford Forumê ku berameyek e ji bo penaber entegreyî nav civakê bibin û kar peyda bikin. Min dest bi nivîsandina gotareke li ser cil û bergên Sûriyeyê kir û li Muzeya Pitt Riversê çûm kurseke rêbertiya tûrên muzeyan. Me xelata tîma dilxwazan ya herî baş ya Keyaniya Yekbûyî wergirt. Karê bi dilxwazî baweriyeke zêde da min ku bi kesên înglîzîaxêv re biaxivim û înglîzî çêtir fêr bibim û li Oxfordê ji xwe re hevalan çêkim. Her wisa ez li muzeya Pitt Riversê wekî asîstanê ziyaretvanan û li heman muzeyê wekî rêberê tûran ketim kar.

Li Keyaniya Yekbûyî giringiya dilxwaziyê berevajî rewşa li Sûriyeyê ku ji bo peydakirina kar pêdivî bi gelek srtîfîkayan heye, di qadeke hûn dixwazin de hûn tecrubeya pratîk dibînin. Ez kêfxweş im ku niha karekî min û dahateke min heye ku min ji bo dewamkirinê û xwepêşxistinê han dide. Niha ez xwe amade dikim ku li Keyaniya Yekbûyî li zanîngehekê dîrokê bixwînim. Ez pêşniyarî her kesî dikim ku bibin dilxwaz, ji astengiya zimên netirsin û xwe nedin alî. Berevajî vê, bi karên dilxwazî hûn ê di demeke kintir de zimên zêdetir fêr bibin. Ez ji bîr nakim ku mamosteyekî me yê dibistanê gotibû ‘em li dibistanê %20ê zimên fêrî we dikin, yê mayî divê hûn fêr bibin’. Herin û bibin dilxwaz, heke ji bo rojekê be jî hûn ê cudahiyê zû bibînin û serkeftinê bi dest bixin. Bextê we vekirî be!”